SERKETIN

www.tevgerakomunist.com

Hejmar: 06

Dîrok: Cotmeh 2022

DENGÊ ŞOREŞ Û AZADIYÊ



Şoreşa Cotmehê li ser rûyê erdê yekemîn mînakeke avakirina şoreşeke sosyalîst e. Ji ber vê yekê bi aliyên xwe yên pêşketî û bi kemasiyên xwe ji bo tevahî çîna karkeran, gelên bindest û jinan weke çavkaniyeke tecrûbeyan e. Şoreşa Cotmehê çavkaniya xwe ji felsefeya Marksiyetê digire. Şoreşa Cotmehê ya ku di rêbertiya Lênîn de Bolşevîkan pêk anî ye di cîhanê de hîna şoreşa civakî ya herî mezin e. Şoreşa Cotmehê, di dîroka mirovahiyê de rê li ber cîhaneke ku serdestiya burjuwazî û mêtîngêriya kapîtalîst bi dawî bibe û jiyaneke bêçîn, bêsînor û azadîxweziya jin vekir.

Nêzikî 100 salên piştî şoreşa Cotmehê, li Rojava ya ku yek ji çar parçeyên Kurdistina ku di bin nîra mêtîngêriyê de bû gelên bindest careke din derketin sehneya dîrokê. Bi şoreşê dawî li desthiladariya BAAS a mêtînger hat anîn. Rojava weke şoreşeke jin, ji bo gelên Rojhilata Navîn û cîhanê deriyekî azadiyê yê nû vekir. Şoreşa Rojava piştî sed salên şoreşa Cotmehê bû deriyê azadiya gelan. Derewa kapîtalîstan ku digotin "êdî serdema şoreşa qediya" bi şoreşa Rojava vala derket. Şoreş bi fêrbûna ji tecrûbeyên hev dikare mezin bibe. Di 105'emîn salvegera xwe de şoreşa Cotmehê rê nîşanî şoreşa Rojava û gel, karker û kedkaran dide.

2 ROJEV:

Berpirsiyarê Tevahî Şerên Paşverû, Dagirkerî û Mêtîngeriyê... فهي مصدر خبرات لفئة العمال والمضطهدين والنساء بأوجهها ومزاياها المتقدمة. تستمد ثورة أكتوبر مصدرها من فلسفة الماركسية. لا تزال ثورة أكتوبر ، التي شنها البلاشفة بقيادة لينين ، أكبر ثورة اجتماعية في العالم. لقد مهدت ثورة أكتوبر ، في تاريخ البشرية ، الطريق لعالم تنتهي فيه هيمنة البرجوازية والاستغلال الرأسمالي وحياة بلا طبقة ، بلا حدود وحرية للمرأة. بعد ما يقرب من ١٠٠ عام على ثورة أكتوبر ، في روجافا ، وهي واحدة من أربعة أجزاء من كردستان كانت تحت نير القهر ، ظهر الشعب المظلوم مرة أخرى على مسرح التاريخ. أنهت الثورة حكم البعث القمعي. باعتبارها ثورة أضبحت ثورة روج آفا بابًا جديدًا للحرية لشعوب الشرق الأوسط والعالم. أصبحت ثورة روج آفا بوابة لحرية الناس بعد مائة عام من ثورة أكتوبر. أكذوبة الرأسماليين القائلة بأن "عصر الثورة قد انتهى" لم تنجح مع ثورة روج آفا. يمكن للثورة أن تنمو من خلال التعلم من تجارب بعضنا البعض. في الذكرى ١٠٥ لتأسيس ثورة أكتوبر ، تظهر ثورة أكتوبر الطريق لثورة روج في الذكرى ١٠٥ لتأسيس ثورة أكتوبر ، تظهر ثورة أكتوبر الطريق لثورة روج أفا والشعب والعمال.

إن ثورة أكتوبر هي المثال الأول لبناء ثورة اشتراكية على وجه الأرض. لذلك

JÎN:

Navê Kolanên Îranê, Jîna Mahsa Emînî

BÎRDOZÎ:

Serkeftin; Bi Şehîdan Tê Bi Dest Xistin CiWAN: Peşengên Komûnîst Me Ferhad Erebo û Metîn Dîcle Sax in Tu Carî Namirin ROJEV

Berpirsiyarê Tevahî Şerên Paşverû, Dagirkerî û Mêtîngeriyê Pergala Kapîtalîst û Emperyalîst e

Şerê navbera Ûkraynî û Rûsyayê berdewam e. Rewş nîşan dide ku wê hîna ev şer dirêj bike. Hêzên ku şer dikin ji polîtîkayên xwe hîna xiramek paş de gav neavitine. Bi ser de jî biryarên nû yên leşgerî û polîtîk ku rewşê hîna girantir bikin distînin.

Rûsya ragihand ku axên Herson, Zaporiya, Donetsk û Lûhansk ku dagirkiriye tevlî axên xwe kiriye. Ji bona vê referandûmek (dengdayina gelî) çêkir. Referandûmên ku di bin rewşa şer de tên kirin tenê qewlikê hiqûqî nê. Ev referandûm dagirkirina çar herêman ji aliyê Rûsyayê ve ye. Ev Peyman û referandûm pêkenoktiya (komik) hiqûq û demokrasiya burjuwaziyê nîşan dide. Hiqûqa burjuwayî ya navneteweyî û pergala parçebûyî ya dewletan fermiyeta xwe winda kiriye. Dixwazin li gorî parvekirineke nû her tiştî ji nû ve sererast hikin

Siyaseta dewleta Tirk a dagirkirina axên Sûrî, Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûrî û xistina bin hîmaya xwe jî yek ji encamên vê siyasetê ye. Qeyrana navbera Emerîka û Taywanê jî berdewamiya heman ferasetê ye. Ev geşedan û dane nîşan didin ku rekabeta aborî û siyasî ya di navbera hêzên kûrewî yên emperyalîst de derketiye asteke nû. Ev qeyranên leşgerî û siyasî yên ku li herêmên nû belav bûne pêşêngên şerên hîna mezintir in. Di her du şerên emperyalîst ên parvekirina cîhanê de têra xwe hatiye tecrûbekirin ku şerên paşverû, dagirkerî û emperyalîst çawa di xweza û jiyana mirovan de wêraniyeke mezin derdixe holê.

pêkanînên kapîtalîst, Feraset emperyalîst û mêtînger li her derê weke hev in. Kapîtalîzm û burjuwazî weke çîneke kevneperest li pêşiya her cure pêşketinê xeterî û astengiya herî mezin e. Berpirsiyarên qeyran û şerên li dewerên cuda yên cîhanê di serî de Emerîka, dewletên Ewropa, Îngilîstan, Rûsya û Sîn in. Li Rojhilata Navîn jî dewletên Tirkiyê, Îran, Iraq, Sûrî, Îsraîl, û Erebîstana Siûdî ne. Cîhan û jiyaneke bêyî wan êdî neçarî ye. Bersiva nû ya bindestan li dijî qeyrana pergala kapîtalîst- emperyalîst û polîtîkayên şer wê şoreşên nû yên Cotmehê, şoreşên nû yên Rojava û şoreşên jinan bin.

Li Rojhilata Navîn Şoreşeke Jin a Nû Bilind Dibe

Li Îran û Rojhilatê Kurdistanê bi pêşengtiya jinan bi dirûşmeya "Jin Jiyan Azadî" serhildaneke nû destpê kir. Jineke Kurd a bi navê Jîna Emînî ku piçek ji porê wê xuya dikir tê binçavkirin û piştre bi şkenceyên giran tê qetilkirin. Ji ber van sedeman li Îranê gelek jin rastî tundiya dewlet û zilaman tên binçavkirin û kuştin. Li dijî vê jinan got "Êdî bes e." Li dijî rejîma Îranê ya îslamî ku bi salên dirêj desthildar e rabûn serhildanê. Beşeke girîng ji gelê Îranê piştgirî dan vê serhildanê û tevlî

vê serhildanê dibin. Ew tên binçavkirin, şehîdan didin. Tevî ku dîkdatoriya Melelî li dijî serhildanê her cure tundiyê bikar tîne jî, çalakvan bêyî gav avêtin têkoşîna xwe berdewam dikin. Ev serhildana mafdar û şoreşger, li herêm û cîhanê piştgiriya gelên bindest stand. Li her derê çalakiyên piştgiriyê mezin dibin.

Çîna desthiladar li Îranê bûrjûwaziya Melelî ya kapîtalîst e. Rejîma Melelî faşîst e, mêtînger e, pêkhateya şerên paşverû yên li Iraq û Sûriyê ye. Zilmeke mezin li çîna karker û bindestan, bi taybetî jî li jinan dike. Em bi serhildana ku di pêşengtiya jinan de pêş dikeve êdî di demên dawî lê anîna serweriya dîkdatoriya rejîma Melelî ya serdestiya zilam a faşîst de ne. Îro nebe sibe, sibe nebe di demeke nêzik de! Lê bêguman ev têkoşîn wê bi ser bikeve.

Êrîşên Li Dijî Gerîla û Kadroyên Pêşeng

Li dijî êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk a faşîst û mêtînger ên li ser qadên Bakurê Kurdistanê yên gerîla, gerîla bi vîn û wêrekiyeke mezin şer dike. Li dijî hêzên dagirker û PDK'ê ya ku bi wan re di nav hevkariyê de ye şerê azadiya netewî û rûmetê didin. Di ev şerê dagirkeriyê de PDK'ê tevgerkirina bi dijmin re berdewam dike. Di hevkariya bi dijmin re sînoran nas nake. Bi piştgiriya îstixbarata erdî ku dide dewleta Tirk dihêle ku li dijî kadroyên pêşeng, fermandar û li dijî gerîla sûîqestên namerdane pêk werin. Ji bo hêsan tevgerkirina dewleta Tirk çi ji dest derdikeve wê dike. PDK'ê bi ev kiryarên xwe nîşan dide ku çawa li pêşiya serkeftina têkoşîna Kurdistaneke azad û yekgirtî dibe astengî. Beramberiya vê xatê li Rojava ENKS'ê ye.

Şerê dewleta Tirk a faşîst a li dijî Rêveberiya Xweser lêza xwe qut nake. Bi awayekî sîstematîk erdên me bomberan dikin. guhertina xebata demografyayê berdewam dikin. Sixuriyê li ser gel ferz dikin. Ji bo vê jî serî li her cure tundî û gefan didin. Bi destevêtin, koçberkirin, destesarkirina mal û warên wan û bi kuştinê tehdîd dikin. Bi nehîştina şert û mercên jiyaneke birûmet li ser axên xwe weke mirovên azad zor li wan dikin ku bibin sixûr.

Zirarên ku li dijî ev pêkanînên şerê taybet, li dewsa parastina rûmeta xwe sixûrî û hevkariyê qebûl dikin didin şoreşê gelekî mezin e. Di encamên van xebatan de gelek xebatkar û kedkarên hêja yên Rêveberiya Xweser, şervanên PKK'ê û MLKP'ê û kadroyên pêşeng di êrîşên sûîqestê de şehîd ketin. Rêhevalên me Metîn û Ferhad di encama xiyaneteke wiha de şehîd ketin. Tu tişt nikare bêrûmetiyeke bi vî rengî bêguneh nîşan bide. Feqîrtî, tunebûn û tirs nikare bibe sedema karekî bi rengî. Aksî

wê li ku derê xizantî, mêtîngerî, zilm, zext û dagirkerî hebe helwesta herî birûmet hilbijartina rêya şoreşger û komûnîst e.

Wek ku di dîrokê de jî tê zanîn ne partiyê me, ne jî gelê me ew kesên ku xiyanetê dikin tu carî bêgerew nehiştiye. Em ê ji ew kesên ku Rêheval Metîn û Ferhad qetilkirin û ji hevkarên wan hesap bipirsin. Em ê destên ala sor a das û çekûç ku rêhevalên me ji me re mîras hiştin bilind dikin zêde bikin.

Azadkirina Axên Di Bin Dagirkeriyê de!

Dewleta Tirk a faşîst û mêtînger teva çeteyên xwe ji bo ku ji welatê me cihên nû dagir bikin li derfetan digerin. Ji bona vê gelek xebatên dîplamîtîk meşandin. Ji bo niha ji dewletên Emerîka, Rûsya, Îran û Sûrî erêkirina rasterast nikarîbûn bigirin. Lê bi dewletên Rûsya û Sûrî ve têkîliyên xwe şidandin. Serokên îstixbarata van dewletan dest bi hevdîtinên eşkere kirin. Pîlanên rakirina ji holê ya şoreşa jin û welatê Rêveberiya Xweser an jî pîlanên dagirkirina bi hev re nîqaş dikin. Di her alî de têkîliyên Tirkiyê vi NATO û Emerîka ve berdewam in. Têkîliyên xwe yên bi Îranê re jî şirîktiya xwe li ser esasa ku ji bo li Rojhilata Navîn dewleteke Kurd ava nebe berdewam dikin.

Dijminên me dixwazin DAIŞ'ê ji nû ve xurt bikin, şerê dij şoreşê û tevlîheviyê di nav ax û warên şoreşê de belav bikin. vala nasekinin. Demên xwe, derfetên xwe, têkîliyên xwe yên navneteweyî ji bo pêkanîna ev pîlan û hedefên xwe bikar tînin. Ev sedema hebûna wan e. Ji bo li ser piyan girtina pergalên xwe yên riziyayî serî li her cureyê şer didin. Rêya vala derxistina armancên dijminên me, dagirker, mêtînger, emperyalîst, çete û hevkarên wan bi awayekî serkeftî bi rêxistinkirina şerê şoreşger pêkan dibe. Tenê bi serkeftinê em dikarin zehmetiyên serdemê derbas bikin û pîlanên dijmin têk bibin. Şerekî ku gel di her milî de di nav de ye tu carî têk naçe. Tiştekî ku pergala kapîtalîst-emperyalîst bide gel tune ye. Li dewsa ku em ji wan re weke leşgerên bipere şer bikin, ji bona wan di rêyên koçberiyê de bimirin, li dewsa ku em ji bo wan bibin hêza erzan a kar, beden û rihê xwe bifiroşin, divê em ji bo xwe, ji bo rûmet û azadiya xwe şer bikin. Ji bo ku em vê yekê bi ser bixin hîna zêdetir rêxistinbûn û zanebûna pêwîst e. Divê em ked û dema xwe ji bona vê xerc bikin.

Rêya tacîdarkirina bi serkeftinê xeyalên rêheval Ferhad û Metîn di vir re derbas dibe. Bi mezinkirina rêxistinkirina TKŞ, JKŞ, CKŞ em ê li welatê xwe yê Rêveberiya Xweser bibin pêşêngên raman û jiyana sosyalîst.

JÎN <u>SERKEFTIN</u>

Navê Kolanên Îranê; Jîna Mahsa Emînî

Jîna Mehsa Emînî ya ku di 16'ê Îlona 2022'an de li Rojhilatê Kurdistanê bi awayekî hov hatiye qetilkirin bû pêşenga serhildaneke ku bi hefteyan berdewam dike ye. Çalakî belavî seranserî cîhanê bûn. Êdî rejîma Melelî ya Îranê û tevahî jinên ku li Îran, Rojhilatê Kurdistanê jiyan dikin gîhaştine xaleke werçexê.

Li Îranê bingeha siyaseta rejîma Melelî ya faşîst li ser bedena jinê hatiye avakirin. Jina ciwan Jîna Emînî ji bo ku parçeyek ji porê wê xuya dike ji aliyê polîsên exlaqê ve bi şkenceyên qiran tê qetilkirin. Ev dibe teqîna serhildana jin û gelan. Serhildan di pêşengtiya jinan de bi dirûşmeya "Jin Jiyan Azadî" dizivire lêgerîna azadiya polîtîk a gelên bindest. Di serhildana ku hîna berdewam dike de bi hezaran jin porên xwe yên ku weke "Namûs" tê hesibandin digusînin, hîcabên ku ser namûsên wan digire dişewîtinin. Jinên Rojhilatê Kurdistan û Îranê eynî weke xwişkên xwe yên li Rojava-Bakur û Rojhilatê Sûrî pêşengtî ji erefeya şoreşê re dikin û Îranê ber bi soreseke rast ve dibin.

Ji Dîroka Têkoşîna Jinên Îranê Rûpeleke Kin

Di navbera salên 1980 û 83'an de qaşo şoreşek lidar ket. Ew şoreş her çiqasî ku şoreşeke gelxwez xuya bike jî şoreşeke hilweşandina serweriya şax bû. Hûmeynî hêvî dida ku wê av, kehrebe, serwîs ji bo gel beleş bibe. Digot "Pereyên ku ji petrolê tê eydî gel e, û ev pere wê li gel bê belavkirin." Bi vî awayî wê ji xizantiyê xilas biba ne û wê bigîhiştana jiyaneke xweş û xweşguzariyê. Li ser vê beşek ji gel û jinên Îranê ji piştgirî dan vê şoreşê.

Encax hema piştî şoreşê yek ji talimata ku Humeynî dabû ew bû ku jin bi temamî bikevin hîcabê. Hema piştî ev talimata Humeynî di 8'ê Adara yekemîn a 1979'an de li bajarên mezin ji aliyê jinan ve çalakiyên mezin hatin lidar xistin. Bi hezaran jinan di van çalakiyan de bi qirîneke mezin dan xuyakirin ku wê tu carî dev ji azadiya xwe bernedin. Di van çalakiyan de jin bi hêzên rejîma Melelî ya faşîst ku weke Mihafizên Şoreşê (Besiç) tên bi nav kirin ve rû bi rû man.

Li dijî berxwedana jinan, mihafizên şoreşa Humeynî ji bo şkenandina vê berxwedanê cur bi cur rêbaz bikar anîn. Weke rêbazên hov ên wek avêtina porê jinan a boyaxa zeyatî, avêtina zaxaf, bizmarkirina hîcabê bi eniya jinan de hat bikar anîn. Mihafizên şoreşê weke parçeyek ji şoreşa



Humeyni ya paşverû mecbûr dihişt ku jin di zanîngehan de hîcabên weke turik ên rengê wan girtî bikar bînin û mecbûr dihiştin ku rengê caketê wan jî girtî bibin. Serokê Meclîsa Wezîrên Parêzker ên Îslamperêzî yên radîkal Ayetûlah Cenetî di nimêja 21'ê meha 5'an a 2010'an de wiha got "Êdî di welat de rewşa awarte heye, ji bo şagirtên jin karibin ezmûnan bi serkeftî derbas bikin mecbûr in li gorî quralên hîcabê tev bigerin." An jî bi quralên şerîa mecbûr dihat hiştin ku di ji malê dernekevin. Ji bo jinên ku dixwastin bixebitin guralên hîcabê hatibûn danîn, ji bo jinên ku li gorî van quralan tev nagerin jî ji îdamê bigire heta her cure siyaseta zextê weke gefxwerin dihat meşandin.

Di şoreşa Îranê ya îslamî a rejîma Melelî ya faşîst de aksî ku ji gel re hat şirovekirin li Îranê şertên jiyanê hîna zehmettir bûn, tundiya Dikdatoriya faşîst her ku çû zêde bû. Di encama vê de di salên 2009, 2017 û 2019'an de dîsa serhildan çêbûn. Gelên Îranê ji bo azadiya polîtîk, aborî, zexta ser gelan serhildan derketin. Lê ev serhildan bi awayekî hov û bixwîn hatin perçiqandin.

Li Rojhilatê Kurdistanê Şertên Şoreşê Yên ku Pêş dikevin

Lewma serhildana ku îro li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê tê jiyîn tenê ne di encama qetilkirina jinekê ye. Di encama ev siyaseta rejîma faşîst a Melelî ya Îslamî de şertên şoreşê kemilî ye. Daneyên ku di encama bi awayekî hov qetilkirina Jîna Emînî de derketine holê, siyaseta rejîma faşîst a Melelî ya paşverû ya li ser tevahî gelan a bi deh salan e êdî nîşan dide ku gel vê siyasetê qebûl nake. Serhildana ku bi boneya qetilkirina Jîna Emînî di destpêkê

de bû qîrîna jinên Kurd, Faris, Belûcî, Lor û HWD. Dirûşmeya "Jin Jiyan Azadî" bû bingeha serhildanê. Jin, ciwan, zilam, dayik û bav, bi mîlyonan kes bi dirûşmeya "Jin Jiyan Azadî" li kolanên Îran û Rojhilatê Kurdistanê li dijî faşîzma rejîma îslamî agirê azadiyê pêdixin.

Jîna Emînî ya 22 salî nizanîbû ku lêgerîna wê ya azadiyê wê bigêhêje vê astê. Berpirsiyartiya peşvebirina şoreşê ya vê serhildana ku di pêşengtiya jinan de mezin dibe li ser milên me ye. Em weke jinên komûnîst qulipandina gotina "Li kuderê netew û gelekî bindest hebe em ê li wir bin" ya "Li kuderê jinên bindest hebin em ê li wir bin" car caran berê xwe bidin wir. Ya din jî divê li cihê ku em lê jiyan dikin de bi mêjiya xwe, dilê xwe, bi rêxistinkirina vîn û xebatên xwe vê ser bixin.

Divê em çalakî û xebatên xwe yên ku piştgiriya jinan û tevahî gelên bindest bixe holê zêde bikin. Hîna zêdetir mezinkirina şoreşa jinê ya Rojava, hîna xurtir rêxistinkirina piştgiriya jinên bi Rojhilat û Îranê ve pêwîst e.

Êdî gelên bindest teva şoreşa Rojava derbasî asteke nû bûn. Îro serhildana Jîna Emînî careke din nîşan da ku karker, kedkar, jin, ciwan û gelên bindest êdî naxwazin wek berê jiyan bikin. Li Rojhilata Navîn serhildanên gelê Ereb ên 2011'an ev rastî di wê demê de jiyan kiribûn. Lê rêxistinkirina hêrsên bindestan û pêşengtiyeke şoreşger li ser milên me yê. Ev serhildan tenê bi pêşengtiyeke şoreşger û li dijî zor bikaranîna rejîma Îranê tenê bi bikaranîna tundiya bindestan dikare ber bi şoreşekê ve biçe.

CİWAN

Peşengên Komûnîst Ferhad Erebo û Metîn Dîcle Sax in Tu Carî Namirin

Wekî ku dewleta Tirk a faşîst her carê pêşêngên û fermandarên vê şoreşê hedef digirin careke din ji şkenandina hêz û manewiyata şoreşê û vîna komûnîstan di 16'ê Îlonê de bi destê xiyanetkaran bi rêya sûîqestekê du hevalên me di kemînekê de şehîd xistin.

Weke ku di jiyanê de xata rûmetê heye, xata xiyanet û kedxweriyê jî heye.

Dîrok her tiştî dinîvîse, weke ku qehreman hene xayin jî hene. Çawa ku şoreşger dîroka xwe bi qehramantî dinîvîsin heval Ferhad û heval Metîn jî dîroka xwe bi afirandina qehramantiya şoreşê nivîsandin. Wekî şehîd Ferhad digot "Hem şoreşger hem xayin dikarin di dîrokê de cih bigirin, hûn ê di kîjan dîrokê de xwe bidin nivîsandin? ew dîrok jî wê we bîne ser ziman." Rêheval Ferhad û Metîn di dîroka şoreşê de cih girtin û heta dawiya dilopa xwîna xwe ji bo sosyalîzm û komûnîzmê di hundirê şoreşê de canê xwe fida kirin.

Rêheval Şenol Sağaltıcı yê ku li Rojava bi navê Ferhad Erebo tê naskirin ji netewa Ereb û baweriya Elewî bû. Ew ji bajarê Hatay-Samandagê bû, li wir ji ber bawerî û çanda xwe zehmetî jiyan kir. Rastî siyaseta dewleta Tirk a asîmîlasyonê hat. Li hemberî vê siyasetê hêviya xwe winda nekir û ew hêvî di hundirê wî de bû bizirê şoreşgertiyê. Ew dema ku di sala 2000'an de partiyê nas dike piştî demeke kin dixwaze di nav partiyê de cihê xwe bigire. Weke ciwanekî Ereb û Elewî jiyan di nav partiyê komûnîst de temam û xweş dibe. Ji ber wê di demeke kin de dest bi kar dike û berpirsiyartiyên mezin hildide ser milên xwe. Ji ber têkoşîna xwe rastî şkenceyên dewleta Tirk tê, gelek caran tê binçav kirin. Lê tu carî vîn û baweriya xwe winda

nake. Ew hemû hebûna xwe nezirî şoreş û partiyê dike. Li kuderê pêwîstiya partiyê hebe ew li wir e. Tu carî li gorî xwestekên xwe tevnagere. Ew ji karê ciwanan heta karê ragihandinê, ji çiyayên azad heta şoreşa Rojava êdî kedkarê partî û şoreşê ye.

Di dema xwendinê de hemû kar û xebatên rêxistinê di hundirê zanîngehê de dida meşandin. Ew dibe pêşengê ciwanên komûnîst. Hêza xwe ji şehîdan digire. Di sala 2007'an de di zanîngehê de xwendina xwe diqedîne û bi spasnameya doxtorê beyteriyê derdikeve. Di wê demê de weke fermî dibe endamê partiyê. Di nav rêxistinê de her tim hêz û vîn dide kar û xebatê. Piştî ku derbasî qada ragihandinê dide di vê qadê de jî li dijî çanda kapîtalîzmê û çapemeniya alîgirê wê bi biryardariyeke mezin têkoşîna xwe demişine. Li dijî cezayên hepsê yên gelekî giran ew bi sekneke nebez berê xwe dide çiyayên azad. Perwerdeyên ramanî, bîrdozî, leşgerî, teknîkî, tendurîstî distîne. Pêşengê ciwanên komûnîst, kedkarê qada ragihandina sosyalîst êdî gerîleyekî komûnîst ê li ser çiyayên azad e. Ew şoreşgerê ku xwe li gorî her qadê pêş dixe ye. Dema ku di sala 2011'an de şoreşa Rojava destpê dike ew di nav grûpa yekemîn a gerîla ku berê xwe dide Rojava de ye. Ew weke komûnîstekî Ereb bingeha şoreşa Rojava bi kûrayî fêm dike. Ji ber vê yekê çi pêwîstiya şoreşê hebe xwe li gorî vê birêxistin dike. Ew her çigasî ku gada leşgerî dixwaze jî di wê demê de pêwîstî bi doxtoran heye. Ew qasî zanebûna xwe bêhesap cih digire. Li gorî pêwîstiyê ew êdî doxtorê şoreşê ye. Bi sedan şervanên şer derman dike. Çi ji destên wî derdikeve bi hemû hêza

xwe nezirî şoreşê dike. Doxtor Ferhad Erebo çawa di sala 2016'an de di hamleya Minbic de êdî şervan û fermandarê şer e. Ji bo yekîtiya gelê Kurd ê Ereb semboleke. Ew di vî şerî de bi giranî birîndar dibe, bi salên dirêj nikare bimeşe, dibe gaziyê şoreşê, lê tu carî hêviya xwe winda nake. Em gotinên wî guhdar bikin "şoreşgertî ne lingeke, ez nikaribim bimeşim dikarim bi destê xwe bikim, nikaribim destê xwe bikar bînim dikarim bi çavên xwe, bi çavên xwe nikaribim dikarim bi moral şoreşgertiyê xurt bikim" ev gotin rastiya wî bû. Keda wî ji bo şoreş û partiyê bêdawî bû. Pêşketina wî bêsînor bû. Ligel ku lingekî xwe winda kir heta ku meşiya ev yek tu carî ji xwe re nekir astengî. Ji bo pêşketina xwe digot "Pêşketinên min her tim di noxteya ku zor li min dihat çêbû, ez lê dinêrim partî jî wiha ye, her ku zor lê tê wê gavê di partiyê de gewastin çêdibe. Ew weke doxtor Ferhat Erebo bizirê yekîtî û wekheviya gelan ê şoreşa Rojava ye. Ew pêşengekî komûnîst e ku ala sor a das û çekûç bi biryardariyeke mezin li ser vê axê bilind kir. Di jiyana xwe de tu carî li paş xwe nanêrî û her tim bi hêviya pêşerojê meşiya.

Xeta Welatperêziya Sosyalîst Metîn Dîcle

Rêheval Ümît Tekînê ku li Rojava weke Metîn Dîcle tê naskirin hîna di temenê xwe yê gelekî ciwan de jiyana xwe bi giştî fidayî şoreşê kir. Ew zarokekî ji gelê Kurd ê Mêrdînê ye. Di sala 2013'an de li bajarê Sêwasê zanîngeha şerîa dixwend. Piştî demekê geyda xwe dibe bajarê Amedê. Ew her çigasî hîna di zaroktiya xwe de ji ber şert û mercên şer koçber bibe jî êşa gelê xwe her tim di dilê xwe de jiyan dike. Dema ku diçe zanîngehê jî di nav lêgerîna azadiyê de ye. Ew lêgerîna wî piştî komkujiya Pirsûsê ya 2015'an a li dijî ciwanên komûnîst encam dide. Ew bixe diçe cihê partiyê û daxwaza xwe ya rêxistinbûnê tîne ser ziman. Ji ber ku ew komkujiya Pirsûsê tevahî êş û janên wî derdixwe holê. Tenê xemgînbûn û bi bîr anîna wan têra nake. Ew baş pê dihese ku li dijî ew faşîzm û mêtîngêriya ku ev komkujî pêkanîna an jî ev mêtîngêriya ku bi dehan salan e gelê Kurd bindest dike ev tenê têre nake. Ew jiyana rêxistinkirî dide ber xwe. Her ku di raman, bîrdozî û nazariyê de kûr dibe fêm dike ku li dijî kapîtalîzm û faşîzmê rizgariya gelê Kurd û tevahî gelên bindest xeta welatperêziya sosyalîst e. Ji ber vê yekê dev ji her tiştên eydî kapîtalîzm û çanda wê ber dide û berê xwe dide şoreşa sosyalîst û komûnîst.



<u>SERKEFTIN</u> <u>BİRDOZÎ</u>

Ji ber ev sekna wî ya eşkere û têkoşîna wî ew her tim bû hedefê polîsên Tirk. Tê binçavkirin, tê şopandin, şkenceyên fizîkî, nefsî û HWD. Li ser wî tên ferz kirin. Demekê di zindanan de dimîne, lê tu car li dijî faşîzmê serî natewîne. Ew li ser bangawaziya partiyê derbasî Rojava dibe. Sînorên ku emperyalîstan daniye û Kurdistan kirine çar parçe ji holê radike. Ew wekî pêşengekî welatperêziya sosyalîst êdî di nav şoreşa Rojava de ye. Ji bo mezinkirina ramana sosyalîst û pêşvebirina ber bi sosyalîzmê ve dibe xwedî kedeke mezin. Pêşketina wî rastênhevê şoreşê bi awayekî gelekî lezan çêdibe. Çi pêwîstiya partiyê hebe ew li wir e. Ew şervan e, ew rêveber e, ew fermandar e, ew pêşengê ciwanên komûnîst e. Di milê nazariya partiyê de xwe gav bi gav pêş dixe. Ew ciwanan herî zêde li ser raman û felsefeya Marksiyet û Lênîzmê perwerde dike. Qasî ku wan perwerde dike ji wan fêr dibe jî. Hêrsê wî li hember îxanetê bêsînor e. Ew weke Kesayet dikare weke mirovekî ji hundirê gel bê şirovekirin. Li tevahî cihên ku gav avêtiyê şopên xwe hiştine. Ev jî rastiyeke şoreşgertiyê ye. Ew di nav jiyana rêxistinî de xwe weke bi welatekî an jî herêmekê sînordar nake. Ji bo şoreşa Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê, ji bo şoreşên herêmî Rojava weke deriyekî azadiyê dibîne. Tevahî jiyana wî li gorî fikir û ramana partiyê rêxistinkiriye. Ev rastî wî dike pêşêngekî komûnîst ya şoreşa Rojava. Kesayeta xwe di dil û mêjiya gel de ava dikir. Ji ber wê ye ku niha bi dehan, sedan ciwanên Rojava soza şopandina rêya wî didin. Ew xwediyê kedeke mezin e. Di axaftineke xwe de dibêje "Ez karibim kedeke biçûk jî bidim partiyê ev ji bo min ser bilindî ye" Ew qasî ku ji bo derfeta ked dayina partiyê derfet hatiye dayin spasiya partiyê bike mutewazî ye.

Ji aliyê dijmin ve hedef girtina rêheval Metîn û Ferhat bêguman ne tesadûfî ye. Ew her du pêşêngên komûnîst weke zarokên gelê Kurd û Ereb bûn sembola îtifaqiya gelê Kurd û Ereb, bûn sembola ala sor, bûn sembola fidatiyê, bûn sembola kedê, bûn pêşêngên fikra welatperêziya sosyalîst.

Rêheval Ferhad û Metîn weke şervanên fermandar Baran Serhed bûn şopdarên rêya wî. Ew bizirên fikra komûnîst ku li Rojava bi pêşengtiya Fermandar Baran Serhed ku hatin çandin bi ked û vîna rêheval Metîn û Ferhad zîl da. Niha bi sedan gelê Kurd, Ereb, Suryan, Jin û ciwan di rêya wan de li ser axên şoreşê ala sor hil didin. Hesap pirsîna ji xayinan li dijî rêheval û gelê me erka me ya herî mezin e.

SERKEFTIN; BI ŞEHÎDAN TÊ BI DEST XISTIN

Em di nav rêhevalên ku em bi hev re bi heman armancê têkoşîna şoreşger didin meşandin de nûçeyên nû yên şehadetê dibihîzin. Di şerê ku em li dijî dijminê me yê ku em dixwazin hilweşînin û tune bikin de, hinek ji hevalên me yên xebatê yên ku li kêleka me, wek fizîkî ji nav me gut dibin. Neferê rêzê ye her şehîdek me. Ew di nav me de bûn, kesayetek ji nav me bû. İhtimal e ku sibe dora me ye. Kêliyên yekemîn ku em şehîdbûna wan dibîhîzin, ji bo me gelekî zehmet derbas dibe. Qebûlkirina rewşa ku mirov êdî nikare careke din were gel hev, rêvebirina hîsa bêriyê hêsan nabe. Lê piştre di mêjiya me de nirxên ku me dike me zelal dibe. Em çawa bûn rêheval? Em di heman rêxistinê de çawa bûn hevalên xebatê? Me bi hev re ji bo kîjan erkê hewldana serkeftinê dida? Çi kêfxweşî û keserên me yên hevbeş hebûn? Em bi çi hêvî û çi xeyalan çavên xwe ji roja nû re vedikir?

Rêhevalên Meşa Şoreşê ne Şehîdên Me! Şehîdên me û têkoşîna me ya sosyalîzm û komûnîzmê yek bû. Rêhevaltiya me ya partiyê yek bû. Dil û mêjiya me, ji vir oksîjen (enerjî) digirt. Ger ku mêjî û dilê me ji heman çavkaniyê xwedî dibe û jiyanê diafirîne gelo em dikarin bêjin şehîdên me mirin e? Em weke komûnîst tam ji bo vê sedemê wan weke "Nemirên xwe" bi nav dikin. Ji ber ku yekane sedema wan a hebûnê hebû. Ew jî têkoşîna wan a şoreşger bû. Li gorî ku têkoşîn bi tevahî lezana û kûrbûna xwe berdewam dike, ew jî di têkoşîna me ya ku berdewam dike de jiyan dikin.

Wan jixwe biryara şêweya jiyan û mirina xwe dema ku dest bi şoreşgertiyê kirin dabûn. Ji ber ev biryara wan li ser erkên xwe yên şoreşger şehîd ketin. Şehîdbûn di operasyoneke leşgerî de an jî di cepheyê de, di nobeta di mewziyan û HWD. Çêdibe, ji ber erkeke rêxistinî dema ku di tevgerê de çêdibe, ji ber tevlîbûna civînekê di rê de, ji bo lêgerîna cihekî partiyê, ji bo birina cihekî ya lojîstîk, cebilxane, li ser erka kuryetî çêdibe. Em van mînakan dikarin zêde bikin.

Ew Nemir in, Di Têkoşîna Me Jiyan Dikin!

Şoreşgerek, di nav erkên rêxistin û şoreşê yên rojane yên ku berdewam dikin de dibe ku di dawiya kêliya jiyana xwe de be. Kêliyeke ku li ser erka xwe, di şerekî îradî ku li dijî dijmin dibe ku bibe şerê wî/wê yê dawî. Lê ew êdî wek şehîdek bi hebûna xwe dibe çavkaniya bîrdozî û siyasî. Ji ber vê yekê em ji bo şehîdên xwe yê şoreşê nabêjin "mirin", em dibêjin ew bûn "nemir" Her şehîdekî/ê me di têkoşîna şoreşê de bi afirandina asteke nû diçe. Di têkoşîna siyasî de darizgeheke nû diafirînin. Ên ku li paş dimînin jî bi erka ev asta siyasî

bi hîna pêşvebirinê ve berpirsiyar in. Şehîdên me yên ku bi avakirina asteke nû ya bîrdozî, siyasî û rêxistinî ku weke fizîkî ji nav me qut dibin, di têkoşîna me ya siyasî ku berdewam dike de dijîn. Her çiqasî ku em ala ku wan ji me re mîras hiştiye bihejînin, her çiqasî ku em têkoşîna çîna karkeran û gelê xwe berdewam bikin, şehîdên me ew qas jiyan dikin. Di têkoşîna domdar a çînî û tevgera şoreşger de ew bi hebûna xwe çavkaniya hêzê ne...

Sembola Welatperêziyê ne Şehîdên Me!

Ger ku îro li Rojava jiyan bi tevahî zinditiya xwe berdewam dike, ger ku îro erdnigariya me gelên qedîm ên vir bi rê ve dibin, ev di saya şehîdên me yên ku bajar, gund û kolanên me parastin in de ye. Şehîdên me bi xwîna xwe axên Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûrî av didin û di her biharê de zîl didin û bi hezaran şopdarên wan têkoşîna wan didin meşandin. Ger ku welat, bajar an jî gündeki eydî me nemîne çi wateya welatperêziyê dimîne. Welatperêz kesê ku welat, bajar û warê xwe diparêze ye. Welatperêzên esasî di van kêliyan de derdikevin holê. Ger ku ew nebin gelê me bi komkujî û koletiyê ve rû bi rû dimîne. Ger ku ew nebin gelekî ku bi zimanê xwe nasname û çanda xwe jiyan dikin gengaz nabe. Ger ku ew nebin jiyaneke azad, dadxwaz û ji aliyê kedê ve nayê avakirin. Şehîdên me kesayetên me yên ku di ezmûna welatperêziyê de bi serkeftî derbasbûn e. Wan jiyana xwe li gorî pîvana welatperêziyê avakirin û jiyana xwe bi vî rengî temamkirin.

Dem Dema Ji Nû ve Soz Dayina Şehîdên Me ye!

Em çawa dikarin bi wan re di navbera xwe de girêdaneke zindî ava bikin. Ev bi hîna zêde rêxistinbûn û tevlîbûna têkoşînê, hîna zêdetir erk girtina ser milên xwe gengaz dibe. Bi bîr anîna wan, xwedî derketina mîrasê wan tenê wiha gengaz dibe. Ev di jiyana xwe ya duh de çêkirina guhertinê ye. Ev tê wateya hîna zêdetir tevlîbûna şoreş û xebatên TKŞ'ê.

Di her hilma ku em dikişînin de, di asta ku şoreşa me gîhaştiyê ye keda wan heye. Ger em keda xwe li ser keda wan zêde bikin û xeyalên wan nîvço nahêlin em dikarin wan bidin jiyandin. Bi wan re têkiliyeke hezkirin û rêzdariyeke rastî tenê bi vî rengî tê avakirin. Ger gotin û pratîka me li gorî hev bibe em dikarin mafa rêhevaltiya şehîdên xwe bi dest bixin. Erkên ku herkes ji bo têkoşîna me bi cih bîne hene. Her tim kenandina rûyê şehîdên me tenê bi awayekî hîna şidandî hemêzkirina erkên xwe gengaz dibe. Divê em ji bîra nekin ki çavên şehîdên me her tim li ser me ne, bi jiyaneke ku dikare wan bidin kenandin ava bikin.

من ثورة أكتوبر إلى ثورة روج آفا إن ثورة أكتوبر هي المثال الأول لبناء ثورة اشتراكية على وجه الأرض

لذلك فهي مصدر خبرات لفئة العمال والمضطهدين والنساء بأوجهها ومزاياها المتقدمة. تستمد ثورة أكتوبر مصدرها من فلسفة الماركسية. لا تزال ثِورة أكتوبر ، التي شنها البلاشفة بقيادة لينين ، أكبر ثورة أجتماعية في العالم. لقد مهدت ثورة أكتوبر ، في تاريخ البشرية ، الطريق لعالم تنتهي فيه هيمنة البرجوازية والاستغلال الرأسمالي وحياة بلا طبقة ، بلا حدود وحرية للمراة. في أكتوبر ١٩١٧ (حسب صحيفة اليوم ، ٧ نوفمبر) ، وجه البلاشفة ضربة تاريخية لُحكم البرجوازية من خلال تنظيم الحركة الموحدة للطبقة العاملة والمضطهدين. لقد أنشأت قاعدة بيانات مهمة تؤدي إلى الاشتراكية. كانت الدول الرأسمالية خائفة جِدا من اتِحاد الجِمهوريات الاشتراكية السوفياتية. لأن ثورة أكتوبر أوضحت الطريق لجميع العمال والشعوب المضطهدة في العالم. أعطت الانتفاضة الَّتي بدَّأَت في بتروغراد ٱلأمل لأبعد ركن في العالم. كانت دائرة الاستغلال التي بنتها البرجوازية حول العالم تواجه خطر الانهيار. لم تضيع البرجوازية أي وقت في مهاجمة تدمير الاتحاد السّوفياتي وتدمير أمل الاشتراكية. منذ بداية الثورة نظم حروبا آهلية استمرت لسنوات. أراد الإمبرياليون كسر إرادة الثورة بِهجمات فاشية هتلر على أراضي الثورة. لقد انتزعوا أَيْديهم لفشل الثورة. روسيا ، التي تحوِّلتٍ إلى اسير حرب من قبل النظام الاشتراكي ، أنشأت اتحاد الجَمهوريات الاشتراكية السوفياتية ، الذي كانِ ملتزمًا بوحدة الأمم ومساواتها ، وذلك بفضل ثورةٍ أكتوبر. من خلال تقديم حل عملي لمسألة قومية ، أصبحت مصدر إرباك للشعوب المضطهدة والمضطهدة. أصبحت روج آفاً بابِ الحرية! بعد ما يقرب من ١٠٠ عام على ثورة أكتوبر، في روجافا، وهي واحدة من أربعة أجزاء من كردستان كانت تحت نير القهر، ظهر الشعب المظلوم مرة أخرى على مسرح التاريخ. أنهت الثورة حكم البعث القمي، باعتبارها ثورة المرآة، فتحت روج آفا بابًا جديدًا للحرية لشعوب الشرق الأوسط والعالم. قوى الشرق الشرة المائة قالة المائة الثورة ، التي تقاتل عصابات داعش الفاشية ، التي حظّيت بدَّعم الدول الإمبريالية والدول الإقليميةً المتخلفة ، خلقت معارك كبيرة. حازت المقاومة على دعم شعوبِ العالم المِظلومة. اتسعت أراضي الثورة بالقتال. أصبح مجالًا للحرية لجميع النساء والأشخاصِ الذين يعيشون في المنطقة. الآنّ فتحت ثورة روج آفا صفحة جديدة. هل ستعيش لعقود مثل الاتّحاد السـوفيتي الـذي أسسـته ثـورة أكتوبـر أم

لا؟ هِل ستكون موقع ثورات محلية ضِد الإمبريالية والرأسمالية والحكم الذكوري أم لا؟ كيف ستترك

بصمة في التاريخ؟ ما هو ضروري لنجاح هده

الأهدافُّ؟ ما الِّذي يجب القيام به؟ ما الذي يمكن

لثورة روج آفا أن تَفعله لحل المشاكل ، منَّ خلال



نِجاح النضال الثوري ، بالتعلم من تجارب ثورة أكتوبّر والاتحاد السّوفيتي؟ الطّريقة الوحيدة هي الاشُّنْرَاكيَّة! نحن في الذِّكريَّ ١٠٥ لَثُورِة أَكْتُوبِر. نريِّد أن نجِعل من تجارب الثورات القوة المنيرة للنضال من أجل الحربة الجندربة والطبقية لشعوب غرب وشمال وشرق سورِيا. إن حاجتنا الأكبر هي تدمير نَّظام الإمبريالية الرَّأسمالية ، التي هي العدو الأكبر لشعوب العالم. إنه مزيج من النظرية الثورية وقوة الفعل من خلال التجارب التاريخية. من أجل تطوير الثورة ونجاح الاشتراكية ، هناك العديد من الأشياء التي يمكن أنّ يتعلمها الناس من ثورة أكتوبر العظيمة

ومن النظام السوفيتي. يمر النظام الرأسمالي بأزمة وجودية. الرأسماليون يمر النظام الرأسمالي بأزمة وجودية. في نهاية استمرار حكمهم. تقود البشرية والمجتمع وِالطبيعـة إلى السـطح بسرعـة كبيرة. الرأسـمالية هي أكبر عقبة أمام الوجود البشري. تظهر التجارب التاريخية أنه إذا لم يتم تدمير النظام الرأسمالي ، فلن يتم إنشاء حياة متساوية وحرة. الهدف الرئيسي اليوم هُو الطبقة العاملة والمضطهدون. تدمير النظَّامِ الرأسمالي وإقامة الاشتراكية مكانه ، مما يفتح الباب أمام عالم شيّوعي. لهذا السبب ، فإن ثورة روج آفا هي الباب الذي يفتح على حرية شعوب الشرقُّ الأوسط والعالم. تُريد قُتل الرأسـمَالية التي هي على مستوى الإمبريالية اليوم ، وجعل روج آفاً القّاعدة الجديدة للثورة العالمية. القرن الحادي والعشرون هـو عـصر الثـورات وثـورة روج آفـا هي الخطـوة الأولى للمضطهدين في هذا القرن. إن الثورة التي تتحول إلى الاشتراكية ستحقق نجاحا كبيرا!

الثورة تتقدم مع ثورة المرأة على الرغم من أن ثورة أكتوبر لا يمكن أنّ تسمى ثورة المرآة ، حسب المعرفة

في ذلك الوقت ، فإن الحقيقة هي أن ثورة أكتوبر الاشتراكية كانت بابًا كبيرًا للحرية لجميع النساء وفقًا لظروف ذلك الوقت. في العديد من دول العالم ، ولأول مرة ، تم منح حق التصويت والتصويت بعد ثورة أكتوبر. بعد ثلاثة أيام من إعلان ثورة أكتوبر ، نص دستور ثورة أكتوبر على ما يلي: "في الاتحاد السوفيتي ، تتمتع المرأة بحقوق متساوية في جميع مجالات الدولة والاقتصاد والمجتمع والسياسة". من الكومينات إلى المجالس ، من إدارة المؤسسات إلى إدارة الدولة الاشتراكية ، تنضم ملايين النساء إلى الثورة. من المجال الاجتماعي إلى الجبهات، من المجال الصحى إلى التعليم ، تصل المرأة إلى أعلى مستوى. هذا يعني أن المرأة الشيوعية أعدت ببرنامج نسوي ثوري قبل الثورة وكانت لديها هذه المعرفة في ذلك الوقت. النقطة الأكثر أهمية هنا هي أنه من خلال الاستيلاء على وسائل الإنتاج وإزالة الملكية الخاصة ، تتغير الظروف المادية للمجتمع. هذه بداية إلغاء الطبقات الحاكمة. يقول ماركس، "بدون مشاركة النساء ، لا يمكن أن تحدث ثورات اجتماعية كبيرة" وهذا لا يزال يكشف عن جوهر الفكر الاشتراكي والشيوعي في القرن التاسع عشر. لينين ، زعيم انتفاضة أكتوبر ، يقول: "لا يمكننا أن ننتصر في هذه الثورة ما لم نشرك النساء الموجودات حاليًا بين الجدران الأربعة في إدارة الدولة". لقد قامت ثورة أكتوبر على هذه الفلسفة. ولكن بقدر ما فتحت هذه الثورة الطريق أمام حرية المرأة ، فقد خرج الكثير من الحكمة لضمان هذه الحرية.

وفقًا للبيانات ، بقدر ما تم تنفيذ الصراع الطبقي والاقتصادي والاجتماعي ، كان صراع المعرفة الجنسية ضد هيمنة الذكور أقل. سمح هذا بإنجازات المرأة بالعودة إلى الوراء بعد عام ١٩٣٦ وعودة النساء إلى منازلهن. يمكننا القول إن تقدم إنجازات المرأة في ثورة أكتوبر كان نقطة أساسية في إعادة تأسيس النظام الرأسمالي. النقطة الأخرى الأكثر أهمية هي أن المنظمات النسائية المسماة Jenodyel أغلقت من قبل النساء بعد فترة من الثورة. لقد رأينا أيضًا في ثورة روج آفا أنه بدون إرادة المنظمات النسائية ، لن تتطور المعرفة حسب الحاجة.



SERKEFTIN

قادتنا الشيوعيون فرهاد عربو و متين دجلة إنهم أحياء ، لا يموتون أبدًا

بما أن الدولة التركية الفاشية تستهدف دائمًا رواد وقادة هذه الثورة ، مرة أخرى من اجل كسر قوة وروح الثورة وإرادة الشيوعيين ، لقد استهدف الخونة في ١٦ سبتمبر اثنين من أصدقائنا في كمين. مثلما يوجد في الحياة خط شرف ، هناك أيضًا خط من الخيانة والجشع.

التاريخ يكتب كل شيء ، مثلما يوجد أبطال ، هناك أيضًا خونة. مثلما كتب الثوار تاريخهم ببطولة ، كتب اصدقائنا فرهاد متين تاريخهم من خلال خلق بطولة الثورة. كما قال الشهيد فرهاد ، "يمكن إدراج الثوار والخونة في التاريخ ، في أي تاريخ ستكتب نفس إن؟"

هذا التاريخ سيذكرك ". شارك الرفيقان فرهاد ومتين في تاريخ الثورة وضحيا بأرواحهما من أجل الاشتراكية والشيوعية داخل الثورة حتى آخر قطرة من دمائهما.

